SERMAWEZ 2025

KURMANCÎ

# BAJAR















BESÊ

MEHLUQATÊN EŞREF



MESELEYA MEZIN






PHANTOM

XEYALETEK DIGERE LI CÎHANÊ

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ




Doğan Güzel
MALA KEKO
TELEFONÊN NÛ MESELEYÊN KEVN
DE HERE WURDE SERSERIYÊ HERAM. MA DIYA TE XULAMÊ TE YE ÎCA!... QEY TU FEDÎ NAKÎ BÊNAMÛS!
TE JI BO VÎ TIŞTÎ EZ JI ORTA DERSÊ HANÎM SER TELEFONÊ HE?... NA KEKO!... NA NAYÊM MALÊ... SALAK!
ÛLA HEVALÊ KEKO NIHA EZ Û HEVALAN DI CIVÎNÊ DE NE XWEDÊ BELA TE BIDE USLÛBA MIN XERA MEKE MANYAX
HELLAAA, XÊRE KÛTO, ÇI DINIVÎSÎ WUSA BIHÊRS?
EV ÇI TIŞTÊN BEREDAYÎ NE TU JI MIN DIXWAZÎ KEKO! TU DIBÊ QEY TU AXA YÎ... HÊÊÊ!... TE NABÎNIM... DENGÊ MIN TÊ TE?...
...YANÎ TU YÊ ÎRO NEÇÎ GUND CEM KALÊ XWE, HE BÊNAMÛS?... MA TU FEDÎ NAKÎ, TU JI BAVÊ XWE RE ŞANTAJÊ DIKÎ ÛLA!
...TU Û BAVÊ TE Û LAWÊ TE SILO!... EV ÇI ZILM E HÛN LI MIN DIKIN HAHO!...
ÛLA DAYÊ MA ME BELASEBE EV TELEFON JI TE RE KIRÎ QEY? JI TE RE DIBÊM WEZIYET ACÎL E...
NALET LI TE Û TELEFONA TE BÊ SERSERÎ! NIKARE QÛNA XWE JI BIN NIVÎNAN DERXE Û JI XWE RE SOBÊ VÊXWE, RADIBE TELEFONÎ MILET DIKE, BÊNAMÛS. AHA VA SOBÊ VÊDIXIM Û ÎNŞELA EZ Ê VÊ TELEFONÊ JÎ TÊ DE BIŞEWITÎNIM. DENG TÊ TE?
HAHO PÎREKÊ!... MA ÇIMA NAKEVE SERÊ TE ÛLA, GAVA XEBER DIDÎ QÛNA TELEFONÊ BÎNE BER DEVÊ XWE CAHIL, DENGÊ TE NAYÊ. ALOOO!... DENG NAYÊ!...



Doğan Güzel
KEKO
KEKO ZANE LI HEV BÎNE
EHM, KEKO ABÊ TU WISA DIBÊJÎ LÊ...
HUŞ BE, EHMEQO! TU RABE JI BO TIŞTEKÎ BEREDAYÎ BI HEVALÊ XWE YÊ SALAN RE ŞER BIKE Û PAŞÊ JI BER KETIYE NAVBERÊ DEV BAVÊJE MÛRO. QEŞMER HEWALA! ÇÎZO MÎZO NIZANIM, GERE HÛN SIBÊ LI HEV BÊN. VA MIN NEGO!..
... HUŞ BE, EZ Ê BÊM ŞÎPELEQ. ÎTIRAZ MÎTIRAZ NAXWAZIM, TU Ê SIBÊ WERÎ Û BI DESTÊ MÛRO Û DAWÛDO BIGIRÎ. TE FAM KIR EHMEQ OXLÎ EHMEQ?
KUF... PIF
ARTÎZIYA MEKE OXLIM, DAWÛDO Û HEMÊ NIZAM HEVALÊN TE YÊN ÇEND SALAN E. JI BER ÇEND GOTINAN TU HEQEKÎ TE TUNEY E TU PÛŞTIYAN BIKÎ OXLIM! HEEEE GAVA TE XEBERDA LI NAV ÇAVÊ MIN MÊZE KE ÛLA!
JI XWE RE BAQIL BE, WEKÎ MIN GO SIBÊ WER WÎ CIHÎ Û LI HEV BÊN. HEGER TU NEYÊ HEYA YA!
HADÊ ÛLA BI DESTÊN HEV BIGIRIN... HADÊÊÊÊ! EZ JI KÊ RE DIBÊJIM ÛLA ARTÎZIYÊ MEKIN!
RAST E !
ARTÎZÊ ÇI ÛLA! BES TE EV QAS TIŞT GOTIN KEKO, EV ÇI TARZ E ÛLA!
ÇIII ?!...
NALET LÊ BÊ! JI NIHA Û PÊ VE AN EZ Ê TARZÊ XWE BIGUHERÎNIM AN JÎ EZ Ê JI DU KESA ZÊDETIR KESÎ LI HEV NEYNIM. SÊ KES PIR IN, QAWETA MIN TÊRÎ NAKE...
WE DÊHNA XWE DAYÊ, DAWIYA DAWÎ MÊRIK EM LI HEV ANÎN. ERIKKK!
XWEDÊ JI KEKO RAZÎ BE
OXXX, BÊHNA MIN DERKET YAW!


TIRŞIK
EŞREF MUMCU
WEYY YARÊ PORÊ XWE WEK "RAPÛNZEL" BERJÊR DAYE. DIBÊJE XWE BI PORÊ MIN BIKIŞÎNE JORÊ. EVÎNA ME JÎ BÛ ÇÎROK
ŞAYDÎNO HER DU ŞARZÊ MIN Ê TELEFONÊ JÎ WINDA NE. MIN HER DER SEROBINO KIR LÊ MIN NEDÎT. HAYA TE JÊ HEYE?
DE KA EZ JI KU DIZANIM. MA TELEFONA MIN HEYE, EZ Ê PÊ ÇI BIKIM?
DELALIYA MIN QEY TE PORÊ XWE HINE KIRIYE? ÇI QAS XWEŞ DIBIRIQE, OY EZ BI QURBANÊ
CA BIXWÎNE DIYA TE BI DÛMANÊ ÇI NIVÎSANDIYE, ÇI DIXWAZE DÎSA?
DIBÊJE KU WE MAST FIROT, BI PERÊ MAYÎ 6 MÎTRO DOXÎN BISTÎNIN, BÊCEMÊN MIN TEV BÊ DOXÎN IN
XALÊ HECÎÎ!!! RIYA TE!!! EYNÎ WERÎS E
BIKŞE BIKŞE HINDIK MA KU EZ TE WEK ZEBEŞKÎ HILDIM Û LI ERDÊ BIXIM. BÊNAMÛS
TE DIGO DI BAXÇÊ MIN DE HEWZ JÎ HEYE. MIN JÎ DIGO QEY VÎLLA YE. EV BÛ HEWZ? MIN JI HAWARA XWEDÊ TU LI PÊ BÎ, GOŞTÊ TE LI ERDÊ BE
KUFFF
MÊRÊ MIN QICO WINDAYE
IXQ!
ŞEYTAN DI ÎÇÊ MIN DE YOXINLAŞMIŞ BÛYEEE. TU HÎÇ NIKARÎ WÎ ÇIXARMIŞ BIKÎ DEFOL BIBEEE
ŞEYTANÊ MEZIN DI ZIMANÊ TE DE YE. PÊŞÎ ZIMANÊ XWE HÎN BIBE. PAŞÊ EM Ê JI BO ŞEYTANÊ DI NAVA TE DE JÎ ÇAREYEKÊ BIBÎNIN
ZANA FARQÎNÎ FERHENG KURDÎ
KURO TE MIN BI QABLOYA MÎQROFONÊ WINDA KIR, NÎVIYÊ MIN QABLO YE
MA QEY EV DER PAVYON E? DAWETA KURDA YE KURDA. ÇAVÊ TE LÊ YE TU ME REZÎL BIKÎ? MA T U DIXWAZÎ ME BIKUTIN?

# MEHLÛQATÊN EŞREF



# MESELEYA MEZIN

Şêxmûs Çîçek




HIAAAX!.
BES E ÛLA
AN SIKTIR BE HERE AN JÎ EM Ê BI ŞIKLEKÎ DIN HEL BIKIN
KÊR BE KÊR ÛLAN, GERE EM ÎRO LI VIRA VÎ ÎŞÎ HEL BIKIN!
HEYA MIRINÊ ÛLA, HEYA MIRINÊ!...
BES EEE !...
ÛLAN MA NE HÛN HEVAL BÛN, EV ÇI YE, HÛN WEK WEHŞA HEREKET DIKIN?!.
?!...
HETA DO JÎ WE HEV DIGIRT ÛLA... ÇI BÛYE JI WE OXLIM... EM JÎ JI VAN MESELEYAN FAM DIKIN, LÊ TIŞTA HÛN DIKIN!..
ÇI GÛZ Û KAP IN HÛN NIKARIN LI HEV PAR BIKIN ÛLA! JI BO ORISPIYEKE XAYÎN Î KU GUH NADE KESÎ EV ÇI HALÊ...
ORISPÎ JÎ, QEHPE JÎ TU WÎ ÛLA!.. KÎ JI TE RE GOTIYE TU DIKARÎ DEV BAVÊJÎ ŞATIRÊ!..
..LÊ EV QEHPE JÎ NE NEHEQ E. TU DIBÊ QEY EM ZÊDE BI NAV VÊ MESELÊ KETIN... BES E....
EZ Ê WÊ BIŞÎNIM, LÊ VÊ CARÊ XWEDÎ LÊ DERKEVE... HEGER DÎSA BIREVE HINGÊ QEBÛL BIKE KU DILÊ WÊ NE DI TE DE YE.
HINDIK MABÛ TE ÇI BIANIYA SERÊ MIN BÊAR QÎZA BÊARA. HEY BÊNAMÛS TU ÇÎ MIN NAECIBÎNÎ! NEBÎ NEBÎ TU CAREKE DIN MIN BIHÊLÎ Û BIÇÎ. TEMAM?
ŞATIRÊ.. ŞATIRA MIN

Dawi

Îmam Cîcî nivîsand



# PHANTOM


## XEYALETEK DIGERE LI CÎHANÊ





*Romannûs, derhêner, senarîst û çêker Lee Falk, di 17'ê Sibata 1936'an de bi navê The Phantom (spêle/xeyalet) karakterekî xêzeromanê diafirîne. Wê ev xêzeroman, di rojnameyan de (ji 500'î zêdetir) bê weşandin, li zêdetirî 40 zimanî bê wergerandin û wê her roj bigihê ber destê 60 milyon xwendevanî. Belê, ev xêzeroman Qizilmaske bi xwe ye. Her wiha Lee Falk, dahênerê qehremanê bi nav û deng Qiralê Sêrbazan Mandrake ye jî. Lê divê em ji bîr mekin ku Falk ji xeynî xêzeromanê, şanonivîs e jî ku di şanaoyên wî de lîstikvanên navdar; Marlon Brando, Paul Newman, Charlton Heston jî lîstine.*

*Phantom, bi derpêyê xwe yî li ser cilûbergên xwe li xwe kiriye, bi maskeya xwe ya reş ku tê de ji dêvla çavê wî tenê valahiyeke spî xuya dike, bi du demançeyên xwe yên 45 qalîbreyî û bi gîzmeyên xwe yên reş î dirêj, qehremanê ewil ê bicilûberg ê cîhana xêzeromanê ye.*




***Grîmaske... Heger ev seriya nû li Tirkiyeyê bihata çapkirin her hal wê ji mecbûrî ev nav lê bikirana***

*Rast e, lê gelo bi her hawî karakterekî resen e? Her çend Falk dibêje, gava wî Phantom afirandiye referansa wî klasîkên wekî Tarzan û Zarokê Daristanê bûne, lê êdî em dizanin ku navê qehremanê xwe û cilûbergên wî ji romana serpêhatiyî Fantomayê bi deyn stendiye ku Pierre Souvestre û Marcel Allain bi hev re di sala 1912'an de nivîsandine. Çimkî qehremanê ku ewil cilûbergê lateksî ê li laş tê lefandin û maske bi kar aniye Fantoma ye. A rast antî qehremanê Fransewî Fantoma, pêşengê gelek tişta ye, lê ev babet û mijara nivîseke dîtir e.*




***Fantomaya Fransî, antî qehremanê ewil ê bimaske û bitayt***

*Her wiha mijareke dîtir û cihê nîqaşê ya ji bo cilûbergên Phantom jî rengê cilûbergên wî ye. Lee Falk, ewilî bi rengê gewr cilûbergên wî disêwirîne. Heta çapa rengîn, tu pirsgirêk û muşkîle çê nabin. Lê belê di çapa rengîn a sala 1939'an de, ji ber şaşiyeke çapkirinê mor tê çapkirin û wisa dewam dike. Li hin welatan rengê cilûbergên wî şîn, gewr, torincî û qehweyî ne, lê belê li Tirkiyeyê û li hin welatên Ewropayê bi rengê sor tê çapkirin. Di bazargeriyê de endîşe û fikarên zayendîparêz?..*

*Cudayiyeke din jî ji bo navê rastî yê qehreman e. Di destpêkê de Phantom, Îngilîzekî bi navê Christopher Standish e, lê ji nişkave bi navê Kit Walker wekî welatiyekî DYA'yê dertê pêşiya me. Ev jî ne bes, tew em dibînin ku ji nişkave çîrok di navbera Afrîka û Asyayê de li herêmeke xeyalî derbas dibe. Halbûkî cihê wê yî ewil herêma Bengal a Hindîstanê bû. Çima? Gelo gava wekî macerayên Îngilîzekî yên li Hindîstanê bên berpêşkirin wê wekî dagirkeriyê bê fam kirin? Ma tu dibê berbayî fikareke wiha ketine? Lê ez dibêm fikareke di cî de ye.*

*Phantom, li cîhanê dibe xweybandoreke wisa ku vediguhere tiştekî ji xwe mezintir, dibe cihê hêviyê. Di Şerê Cîhanê yê Dudoyan de, gava Nazî nahêlin weşanên Amerîkî têkevin Norwecê, berxwedêr jî radibin bi kelekan bandên xêzî yên Phantom tînin Norwecê. Ji ber ku Nazî nizanin Phantom weşaneke Amerîkî ye, pêşî li ber nagirin. Norwecî jî bi hêviya ku qedexeyê pûç bikin her roj serpêhatiyên Phantom dixwînin û navê Phantom dikin şîfreya berxwedanê. Lê paşê tê dîtin ku li Îtalyaya di bin serweriya Mussollinî û li Îspanyaya di bin serweriya Franco de tê qedexekirin. Her wiha piştî çend salan em dibînin ku li Arjantîn û Haîtiyê navê Phantom dibe sembola tevgerên dijî hikûmetê. Nebî nebî hûn bi van mînakan bixapin û bibêjin Phantom fîgurekî polîtîk î şoreşger e. Berevajî, taybetmendiyên klasîk ên mîtên qehremanan hemûyan vedigire nav xwe û cih bi cih xwedî dîtineke bigelemşe û qehremanekî jirêzê yê xêzeromanê ye. Di jiyana me de car heye hin tişt ji serecem û naveroka xwe bêtir girîngî bi wan tê dayîn. Di serdemên ku pêdiviya me bi hêviyê heye de, ma em çi mezin nakin, nakin îkon?*

*Qizilmaske, li Tirkiyeyê ewilî di sala 1939'an de di kovara Çoçûk Sesî, Afacan û 1001 Romanê de tê weşandin. Ewilî navê*

Dev Adam (Zilamê Qirase) lê tê kirin. Di sala 1995'an de di rojnameya Tanê de wekî bant tê weşandin. Ji sala 1968'an pê ve bi awayekî serbixwe tê weşandin. Weşanxaneya Tanê ku Sezer Yalçiner damîzrînerê wê bû û meha borî jiyana xwe ji dest, di sala 1973'yan de Qizilmaske çap dike. Ruhê wî şad be, ji ber ku qehremanê zarokatiya me bi me da naskirin.

**Dibêjin li nav nivînan qeweta Phantom bi qasî ya deh pilinga ye**




Li DYA'yê û gelek welatên cîhanê albûmên wî tên çapkirin. Nexasim jî li Awistralya û Hindîstanê daxwazek zêde çê dibe û bi xêzkar û nivîskarên xwecihî serpêhatiyên nû didin xêzkirin. Di sala 1944'an de dibe roman. Di sala 2006'an de li Swêd û Norwecê wekî pirtûka bideng tê çapkirin. Li Swêdê navenda şahiyê ya bi temaya Phantom tê avakirin. Di sala 1943 û 1955'an de rêzefîlm û fîlmên wî tên çêkirin. Di sala 1966'an de fîlmekî wî yê din tê kişandin ku serekerolê wê Billy Zane ye. Li Tirkiyeyê jî di sala 1986'an de dudo, di sala 1971'ê de jî yek, bi giştî sê fîlmên Qizilmaske tên çêkirin.





Her çend xêzkarê Qizilmaskeyê xêzkarê hoste Sy Barry be jî û her çend pir hez ji wan karakterên sermezin, destbiçûk û rengînkirina wan î cipcanî yên bi destê Aslan Şukur li ser bergên wê hatine çêkirin bikim jî, lê belê dikarim bêjim ku wekî qehreman tesîreke mezin li min nekiriye. Madem me behsa xêzkarên wê kiriye, divê em xêzkarê Tirk Ozcan Eralp jî bibîr bînin.

Welhasil em werin ser çîroka Qizilmaske.




**Phantom, cara ewil di vê sehneyê de bicilûberg**

**Rengê mor ji bo kesekî li daristanê dijî rengekî gelekî cegerdar e. Weşangerên Tirk kincên sor li Phantom kirine û bi vî hawî ev pirsgirêk hel kirine. Belê, qehremanê me êdî bi rihetî dikare li nav daristanê bigere.**




Sal 1536. Pîgmeyî, ciwanekî ku ji ber êrîşa heydûd û nijdevanan birîndar bûye dibînin û birînên wî rihet dikin. Ciwanê ku rihet dibe, li ser qoqê heydûdê ku bavê wî kuştiye wiha sond dixwe; heta sax bim ez ê li himber heydûdvaniyê, li himber zilm û bêedaletiyê şer bikim û wê kurên min bidin ser rêya min. Ev Phantomê ewil e.

Phantomê ewil, dîmenê şeytan ê li ser kevir hatiye neqşkirin referans digire ku xwecihî jê re dibêjin Wasaka û pir jê ditirsin, ji xwe re dike referans û li ber cilûbergekî çê dike. Bi vî cilûbergê xwe yê tirsnak derdikeve ber xwecihan û ji wan re dibêje ew Wasaka ye. Xwecihî jî jê bawer dikin. Bi ser de jî dibêje ew nemir e û ev yek berbelav dibe û bi vî hawî iqtidara xwe li ser asasên tirsê zeximtir dike. Xwecih jî şikefteke bi şiklê qoqê mirovan bi keys dikin û Phantom lê bi cih dikin. Xwecihan bela bi serê xwe de aniye. Çimkî ji Phantomên ku tam 400 sal in şûna bavê xwe xwe girtine yek jê jî dev ji wê şikeftê bernade. Bi ser de ometek antîk û cewahirên ku nayê zanîn ji ku anîne li hundirê şikeftê lod kirine. Dû re girava Edenê ku dibe warê aramiyê yê hemû giyaneweran, Girê Phantom, Dehlûdirê Pistepist û Perava Zêrîn jî tev li serweta xwe dikin.

Her çend carinan em xwe noqî pirtûkxaneya Şikefta Qoqê bikin û çîroka kalikên wan sêr bikin jî, lê bi piranî em serpêhatiyên Phantomê 21'emîn Kit Walker dixwînin. Qizilmaske di heman wextê de fermandarê veşarî yê yekîneya Dewriyaya Daristanê ye jî. Phantomê Ruhnemir, tevî hespê xwe Qehreman û gurê xwe Şeytan, carinan li daristanê ye û carinan jî bi parduso, şewqe û berçavka xwe ya reş dadikeve bajêr edaletê dabîn





**Qizilmaske, Mirê Gustîlkan...**

dike. Çimkî ên çav serçavê Phantom bikeve dimire. Bi hungilîska xwe ya li ser îşareta qerqot heye û di destê wî yê rastê de ye li nav çavê xiraban dixe û bi hungilîska xwe ya li ser sembola rebena heye û di destê wî yê çepê de ye jî li nav qevda destê qencan dixe. Bi ya min kesekî bîrsar e. Ew û dergistiya xwe Diana Palmera, di serpêhatiyeke xwe ya ku 41 sal şûnde tê weşandin de dizewicin. Bi navê Kit û Heleoise du zarokên wan çê dibin.

Qizilmaske, qehremanekî çermspî ye, bi liv û tevgerên xwe yên sergewar xwe wekî nûnerê edaletê dihesibîne. Ji bo vê efsaneyan çê dike û bi van efsaneyan tirsê dixe zikê mirovan û bi meharetêên xwe yên ecêb dijminên xwe bi bin dixe. Ji xeynî pîgmeyiyên ew xelas kirine, têkiliya wî ya bi xwecihên din re li ser asasên tirsê ye. Wekî bav û kalên xwe, tam çarsed salî li cem çermspiyan hatiye perwerdekirin, dîsa vegeriyaye daristanê, çûye cem xwecihan bi jineke çermspî re zewiciye. Tu li vê ecêbê! Phantomên ji 21 bavikî hemû bi hêla xwe ya fizîkî û zihnî xwedî taybetmendiyên raser û bilind û zilamên bêqisûr in. Gelo ev yek xurîtîka we jî nayne?






**Û nebêjin ka ez fîlmê wî temaşe bikim, xêzeromana wî bixwînin. Qet nebe xêzên wê xweşik in**



MEHKÛMO
Doğan Güzel
WE SEH KIR... WEXTA HEWADARIYÊ QEDIYA. HADÊ HUNDIR, HER KES HERE HUNDIRRR
XIRRRÇ!...
TEMAM, ME FÊM KIR TE ÇIYA-ASÎMAN ÇÊ KIRINE, QE NEBE NATORMORDAN ÇÊ BIKE, TIŞTÊN EMPRESIYONÎST FILAN BÊVAN, EV RESMÊ KUBÎK JI KU DERKET ÎCA HEVAL. CÊNÎKÊ MIN DIÊŞÎNE
HUNERA RASTÎN MIROVAN ADIZ DIKE
EBÛQAT HAT CIXARE HAT...
HEE, HOOO HEVAL YAŞAR, PANZDEH SAL CEZA LI TE BIRÎNE, DENG TÊ TE? HEVAAAL!
PÊŞÎ HELA CIXARÊN WÎ BIDÊ, BILA HEVAL BÊ SER HIŞÊ XWE, PAŞÊ EM Ê LI SER DOSYEYÊ XEBER BIDIN.
20
CIXARE
SÎPORÊN LI HUNDIR-SÎPORÊN LI DERVE...
BASKEEET
ÇI BASKET ÇI HAL! VALLA ÇU...
BI XWEDÊ TAM LI ORTÊ KET
DEREEEW LI KÊLEKÊ KET
GÎM!
MÊZE MIN GOT, EV SÎPOR JI ME RE NABE... KA EM VEGERIN SER LÎSTIKA XWE YA BERÊ
HEVALÊN KU DI BIN BARANÊ DE XWE ŞIL DIKIN TEMAM, LÊ EV NE NORMAL E HEVALÊ SEYFÎ! TIŞTÊN ENTÎKE MEKE
EYNÎ MÎNA DERVE YE?
HEVALÊN MEHKÛM HINDIK LÊ BÎRANÎN PIR IN...
KOMÎTEYA ME YA BI XÊRHATINÊ... HELA PÊŞÎ BILA HEVALÊN BÎST SALÎ DEST PÊ BIKIN... HEVALÊ NÛ, TU BI XÊR HATÎ...
EZ LI NAV ÇAVÊ PÎLOTÊ KOBRAYÊ, PÎLOTÊ KOBRAYÊ LI NAV ÇAVÊ MIN DINÊRE. DI DESTÊ MIN DE KELEŞKOFEK QIRME...
ALLAH KÛRTARSIN ...

# ZAROKÊN NEMRÛD

MAMO




GUMMM!
CİNG!
CİNG! CİNG!
CİNG! CİNG!
CİNG! CİNG!
CİNG! CİNG!
CİNG!
CİNG!
ÛÛÛ, LI PÊŞBERÎ WE YE!..
EV KÎ YE?
TU DIBÊ QEY EZ WÎ NAS DIKIM?
YAHÛ ÇAWA TU WÎ NAS NAKÎ? APÊ MÛSA YE APÊ MÛSA!
ERÊ WELE, BI XWEDÊ EW E!
HELAL BE JI WE RE, WE PÊ DERXIST. BELÊ, LI PÊŞBERÎ WE APÊ MÛSA!
BAŞ E BIRAWO, LÊ TE EV HEYKEL JI BO ÇI LI VIRA ÇÊ KIR?
JI BO XEBER BIDE?
ÇAWA ÇAWA?
ÇI YEZDAN ÇI QIRAL FERQ NAKE, JI XWE HÛN HEMÛ XEBER DIDIN. DIZANIM HÛN XEBER DIDIN, DENGÊ WE ÇARINAN TÊ MIN. MIN GO HEGER EZ HEYKELÊ APÊ MÛSA ÇÊ BIKIM, BELKÎ EW JÎ WEKÎ WE XEBER BIDE...


ÊÊ TU DIXWAZÎ JI BO ÇI XEBER BIDE?
BIRAKO, KURD DI ROJÊN ZOR Û ZEHMET DE NE. AN KESEK XEBER NADE AN JÎ DENGÊ KESÊN XEBER DIDIN NAYÊ BIHÎSTIN. HEWCETIYA ME BI ZA-NAYÊN MÎNA APÊ MÛSA HEYE.
MERHEBA HEVALNO!
AHA! MIN JI WER GOTIBÛ, VA XEBER DA!
BI XWEDÊ XEBERDA!
DENGÊ APO JÎ XWEŞ E HA!
APÊ MÛSA, HIN TIŞT HENE GERE JI TE RE BÊJIM..
BISE XWARZÊ BISE. HELA EM BÊHNA XWE BERDIN.
LAWÊ MIN HELA GUHÊ XWE BIDE MIN. DEST Û PÊÇIYÊN TE TER BIN. XUYAYE TU HUNERMENDEKÎ BAŞ Î. LÊ TIŞTA TU DIKÎ ŞAŞ E. GERE TU MIN HÛR BIKÎ.
LAWÊ MIN, NA NE RAST E MERIV ZILAMEKÎ BI VÎ HAWÎ BILIND BIKE. MA TU YÊ RABÎ LI NAV MIRIYAN Û PAŞEROJÊ LI DERMANÊ DERDÊ XWE BIGERÎ? MA HÛN HEV QASÎ JÎ BÊÇARE MANE?
ÇIMA?
LÊ??
MA BILA BÊN Û BORAQÊ BIDIN? BILA BÊN DAXWAZ Û RICAYAN BIKIN? MA EZ KURDÊ KU HER GOTINEKE MIN WEKÎ QANÛNÊ DIHESIBÎNE JI XWE RE BIKIM EVD Û KOLE? MA EV BI ME DIKEVE LO?
LÊ EZ XWEŞIK JÎ BÛME HA. NAXWAZIM VÊ ESERA TE XIRAB BIKIM..
MA TU DIBÊ EZ ÇI BIKIM? WELE QEYMÎŞ NAKIM TE HÛR-HÛRÎ BIKIM.
ÇI DIQEWIME HEVALINO? KESÎ JI WE TIŞTEK FÊM
LÊ TIŞTEK HAT BÎRA MIN?..
HUNERMENDEKÎ DESTBIKÊR E, NE WISA? UZUN MEMED.
ERÊ WELE YAŞAR ABÊ. EM AHMET KAYA JÎ PÊ BIDIN ÇÊKIRIN? EM Ê STRANA GUHDARÎ BIKIN...
BIRAKÊ MIN Ê HUNER-MEND. LÊ BINER TE SOZ DA. TU YÊ KESÎ NEYNÎ VIRA.
SOZ, YILMAZ ABÊ. WELE EZ Ê KESÎ NEYNIM VIRA.
GELO APÊ MÛSA BIRIN KU?
TIFÎ! ME JI WÎ HEYKELTRAŞÎ RE BIGOTA WÊ EM JI HEV BIKIRANA!

dawî


HEYA HEJMAREKE NÛ BI XATIRÊ WE

